

*“Ji deriyê teng ve
bikevinê; ji ber ku deriyê
dibe têkçûnê fireh û rê jî
hêsan e û yên ku dikevin*

*wê gellek in. Lê belê
deriyê ku dibe jiyane teng
û rê jî dijwar e û yên ku
wê dibînin kêma in.”*

*Tu Bi Ku
ve Diçî?*

Meta 7,13-14



BANGA JIYANÊ

1. Gelo tu di rêya ku tê de diçî mebesta xwe nas dikî?
Ma tu dizanî çî qasî nêzîkî kendalê yî?
Mîna her kesê ku di rêya fireh de yî
t jî li hember van xetaran kor û kerrî?
Koro: Tu bi ku ve diçî?
2. Tenê piçekî wextê te heye,
Dê abadîni te bigire ligel xwe.
Û îroj, ger cara dawîn saet lêxe,
Îroj li dinê dê bibe roja te ya dawîn.
Koro: Tu bi ku ve diçî?
3. Hê Îsa Xelasiyê pêşkêşî te dike,
Kesê yekane yê ku bikaribe alîkarî bi te bike Ew e.
Tu destên ku dirêjî te bûne dibînin
Û bê têkildarî dikarî Wî derbas bibî û biçî?
Koro: Tu bi ku ve diçî?
4. Şivanê Qenc hê di rêyên fireh da,
Yên windayî û rêşaşkirî digere.
Ma tuyî yê ku îroj bi nasîna hezkirina Wî,
ezman bona Xelasiya wî kêfxweş dibin?
Koro: Tu bi ku ve diçî?

Mafên Text: Yê S. Mechtild von Herff
Diakonissenmutterhaus Aidlingenê
ye û hunermendê wêneyê jî nenas e

Guneh, bi navgîniya Îblisê ku ji serokên milyaketan bû lê li dijî Xwedayê Bilind serî hilda, hate dinê. Bona mezîniya Xwedê û ahenga ezmanan dîsa dîsa lihev bikin, divê ev yê asê bi derve bihata avêtin. Bo vê yekê Xwedê biryar da ku, **“ji beriya afirandina dinê”** Mesîh bişîne (Efesiyan 1,4). Xwedê bona vê plana mezin vê biryarê da: **“Em mirov di sûretê xwe de, wekî xwe biafirînin”** (Afirandin 1,26).

Ji ber ku Xwedayê Bilind dizanîbû mirov dê vê azmûnê qezenc nekin û gunehan bikin got; Xelasiya yekane ÎSA MESÎH e. Ew jî bona hatinê amade bû:

“Wê gavê wisa gotim – Îsa Mesîh, Xelaskerê dinê –: A vay, hatim; Di balora Nivîsa Pîroz bona min hatiye nivîsandin. Ya Xwedayê min, ji kirina daxwaziya te, ez dê zewqê bistînim, Zagona te di kûrahiya dilê min da ye” (Mezmûr 40,7-8). Û bi vî awayî Xelaskerê dinê Îsa Mesîh, ji ber gunehên me, li Orşelmê bona ku wekî berxa qurbanê bimire, 2000 sal berê hate. Gava Wî: **“Hate Bitûmî Kirin!”** Yûhena 19,30 got, Xwedayê Bilind Îsa Mesîhê gunehnezan bona me kir guneh û kesê rast binalet kir (2.Korîntiyan 5,21; Galatiyan 3,13) **“û razi hate ku, bi navgîniya xwîna Wî ya li ser darexaçê ve hate herikandin, wekî dilxweşiyê saz kiribe, li erd û ezmanan bi her tiştî ve li hev werin”** (Kolosiyan 1,2).

Mirov bona biryarekê nedin, her tim dixwazîna rêya navê hîlbijêrin. Lê belê di jiyane de tenê du rê hene: Rêya fireh û rêya teng. Yek banga bona jiyane ye. Ya din jî bona xelaqa abadîni ye. Tu di kîjan rêyê de diçe?

Ji ber gunehên Adem her kes ji bûyîni ve di rêya fireh de ne. Ji ber vê yekê Xudan Îsa Mesîh ji Nîkodîmê mamosteyê Nivîsên Pîroz e re got ku: **“Ez ya rast ji te ra bibêjim, heta ku kesek ji nû ve nezê (nebe) nikare Serweriya Xwedê bibîne... Heta ku kesek ji avê û Ruh – yanê ji Kelama Xwedê û Ruhê Pîroz ve – nebe, nikare bikeve Serweriya Xwedê. Ya ku ji bedenê dizê beden e, – a ku bi navgîniya gunehê xera bûye û têk çûye – û ya ku ji Ruh ve dizê ruh e – dê abadîni di buhuştê Xwedê de be. – Tu bi gotina min ya ji te ra ‘Divê hûn ji nû ve – yanê ji jor, bi navgîniya Ruhê Pîroz – bizên’ ecêb nemîne... Ma tu çawa ku mamosteyê Îsraîlê yî, tu vana fam nakin?”** (Yûhena 3,3.5-7.10).

Ji nû ve bûyîni, şop guhertin e. Tu, bona ku were rêya jiyane, bona ji rêya xweza were rêya jiyana ruhanî, divê tu şopê buguhere. Ya ku hûn di wêneya bergê de dibînin jî ev e: Mirovê xweza di rêya fireh de diçe. Mirov, bi navgîniya Mesîh biçe buhuştê, divê vê rêya fireh biterikîne. Her kî tobe bike, bi awayekî

rastî gunehkariya xwe ji Xudan Îsa Mesîh re bibêje û wî vexwendî dilê xwe bike, dê rastiya bilind ya di beşa Koloseyî ayetên 1,13 û 2,13’an de nivîsandîne bijîn: **“Wî me ji ferweraniya tariyê xelas kir û danî serweriya Îsa Mesîh... û çaxa hûn ji ber sûcên xwe ... mirî bûn, Xwedê we bi Mesîh ve gihand jiyane. Wî li hemî sûcên me bexşandin.”**

Xwedayê Bilind vê xelasiyê saz kir. Divê tu ji vê Xelasiyê di baweriyê de qebûl bikî. Bi vî awayî tuyê di rêya jiyane de bî. Bawerî rasteqîniyê qebûl dikî û di wê de dijî.

Hew di kesê ku di rêya Xudan Îsa Mesîh de, di deriyê teng û rêya dijwar ve diçe de jiyane heye. – Mebesta rêya te ku de re? Tu bi ku ve diçe??

Gerhard Schadt-Beck

Gotina Xwedê-Încîlê Bixwînin!

Navnîşana me ev e:
Hoffnung & Leben e.V.
Postfach 101382
33513 Bielefeld
Almanya

Publisher:

Evangelischer Missionsdienst **LAV** – **LEHRET ALLE VÖLKER** e. V.
Postfach 154, 74348 Lauffen a. N. Fon + Fax: 07133 - 7527
International: 0049 - 7133 - 7527
E-Mail: lav@lehret-alle-voelker.de
Homepage: http://lehret-alle-voelker.de

Manufacturer:

druckerei**bothner** · Heilbronner Straße 14-16 · 74348 Lauffen a. N.
http://druckerei-bothner.de

The buyer - ya ne editor! - berpirsiyar ji bo belavkirina caiz vê belgeyê.

Xwendevanê me yî hêja! Ger di derbarê vê mijara ku we xwendine de, tiştêkî ku hûn bighînin me an jî ji me re binivîsin, ji kerema xwe, li navnîşana ku me li jêrê daye binivîsin. Em dê bi kêfxweşî bersivê bidin pirsên we.